



K.T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTUYA ZÎMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEEYÊ
MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Projeya Lîsansa Bilind ya Bêtez

**DI EDEBIYATA KURDÎ DE NIMÛNEYEKE
ADAPTASYONÊ: “NIVÎSEVAN” A KAMIRAN
BEDÎRXAN**

Osman AKYOL

15721123

Şewirmend

Alk. Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn 2017

PÊŞGOTIN

Em di vê xebatê de li ser pênaseya adaptasyonê, giringiya adaptasyonê ji bo edebiyatê sekinîn. Ligel wê, di edebiyata kurdî de adaptasyon ji ber çî cihêk taybet digire; bi mînakên berhemên ku ji bo kurdî hatine adaptekirin, raxistiye ber çavan.

Sedema bijartina min a vê mijarê, kêmbûna agahiyên di derheqê vê mijarê de bû. Ew lêkolînên ku min kirin, min nedît ku heta niha di tu çavkaniyan de di derheqê adaptebûna çîroka Kamiran Bedirxan agahî hatî dayîn. Min bi xwe ev, wekî kêmasiyeke dît û li ser xebitîm.

Di amadekirina vê projeyê de ji ber alîkariyên wan, ez spasîyên xwe pêşkeşî hevalê xwe Mehmet Zekî Aydın, herdu birayên xwe Yusuf û Yakup Akyol dikim. Bi taybetî jî ji ber peydakirina çîroka Maksim Gorki ya ji zimanê wê -Rûsî-, ji bo Alk. Doç. Dr. Ekrem Onen spas dikim. Herwiha ji bo alîkarî û şewirmendiya wî malavayiyê li Mamoste Alk. Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK dikim. Hêvî dikim ku ev xebat ji bo lîteratûra kurdî bi qasî dilopekê be jî sîdder be.

Osman AKYOL

Mardin 2017

KURTE

Bikaranîna têgeha adaptasyonê di çend cureyên edebiyatê de -wekî şano, çîrok, berhemên dînî...- derdikeve pêşberî mirov. Bêtir ew gel û zimanên di hewldana pêşveçûnê de ne vê pratîkê bi kar tînin. Ew jî serkeftin û pêşveçûna wî zimanê ku behrem jê hatî adaptekirin, nîşan dide.

Dîroka adaptasyonê di edebiyata kurdî de kevn e. Ji Şêxê Sen'an bigire heta Leyla û Mecnûn, ji Mem û Zînê bigire heta Mewlîda Kurdî. Ligel van berhemên klasîk, di edebiyata nûjen de jî nimûneyên berhemên adaptekirî xuya dibe. Di Kovara Hawarê de Celadet Alî Bedirxan, Kamiran Bedirxan û Nûredîn Êsif mînakên çîrokên adaptekirî dane. Adaptasyonên di edebiyata klasîk de ji Rojhilat, ên edebiyata nûjen jî ji Rojava hatine kirin. Kamiran Bedirxan jî çîrokeke Maksim Gorki adapteyî kurdî kiriye. Hevşibiyên gelek mezin hene di nava çîroka resen û ya adapte de. Heta hinek cihên wê yek bi yek werger e. Me ev hevşibî û wekhevî bi riya berawirdkirina parçeyên ji herdu çîrokan anî ber çavan. Herwiha bi peydakirina eslê çîrokê ya Gorkî jî ev teza me piştrast bû.

Peyvên Sereke: Çîrok, Adaptasyon, Berawirdkirin, Hawar, Kamiran Bedirxan, Maksim Gorki

ÖZET

Adaptasyon kavramı çeşitli edebi türlerde -tiyatro, hikaye, dini eserler vb.- karşımıza çıkar. Bu uygulamayı daha çok gelişme çabası içerisinde olan halk ve diller kullanır. Bu durum, kendisinden eser adapte edilen dilin geliştiğinin göstergesidir.

Adaptasyonun Kürt edebiyatındaki kullanımı eskidir. *Şêxê Sen'an*'dan *Leyla û Mecnûn*'a, Kürtçe *Mewlîd*'den *Mem û Zîn*'e. Bu klasik eserlerin yanı sıra modern edebiyatta da adaptasyon örneklerini görmekteyiz. Hawar dergisinde Celadet Alî Bedirxan, Kamiran Bedirxan ve Nûredîn Êsif adapte edilmiş hikaye örnekleri vermişlerdir. Klasik Kürt edebiyatındaki adaptasyon örnekleri Doğu edebiyatından, Modern Kürt edebiyatındaki adaptasyon örnekleri ise Batı edebiyatından yapılmıştır. Kamiran Bedirxan da Maksim Gorki'nin bir hikayesini Kürtçe'ye adapte etmiştir. Gorki'nin hikayesi ile Bedirxan'ın hikayesi arasında büyük benzerlikler var. Hatta bazı yerleri bire bir, direkt çeviridir. Bu benzerlik ve aynılığı her iki hikayeden alınmış parçaların karşılaştırılmasıyla gözler önüne serdik. Ayrıca hikayenin aslına ulaşmamız da bu tezimizi kanıtlar niteliktedir.

Anahtar kelimeler: Hikaye, Adaptasyon, Karşılaştırma, Hawar, Kamiran Bedirxan, Maksim Gorki.

ABSTRACT

The concept of adaptation is encountered in various literary genres such as -theatre, story, religious artifacts etc.- people and languages that are in the further, development efforts use these applications. This case indicates the improvement of adapted language.

The use of adaptation in Kurdish literature is old. From Şêxê Sen'an to Leyla û Mecnûn, from Kurdish Mewlîd to Mem û Zîn. In addition to these classical artifacts, we see examples of adaptation in modern literature. Celadet Alî Bedirxan, Kamiran Bedirxan and Nûredîn Êsif have given adapted story examples in Hawar magazine. The examples of adaptation in classic Kurdish literature are made from the eastern literature and the examples of adaptation in modern Kurdish literature are made from the western literature. Kamiran Bedirxan has also adapted one of Gorki's stories to Kurdish. There are big similarities between Gorki's story and Bedirxan's story. In fact some stages are direct translation. We showed similarities and differences by comparing the pieces taken from both Gorki's story and Bedirxan's story. Reaching to the origin of the story also proves our thesis.

Key Words: Story, Adaptation, Comparison, Hawar, Kamiran Bedirxan, Gorki

NAVEROK

PÊŞGOTIN	I
KURTE	II
ÖZET	III
ABSTRACT	IV
NAVEROK	V
DESTPÊK	1
BERAWIRDKIRINA “NIVÎSKAR Û ŞEYTAN” Û “NIVÎSEVAN”	2
DI EDEBIYATA KURDÎ DE NIMÛNEYÊN ADAPTASYONÊ	18
WERGERA “NIVÎSKAR Û ŞEYTAN” A JI TIRKÎ	30
O черте (ESLÊ ÇÎROKA RESEN)	43
ÇİZGİ HAKKINDA (WERGERA GOOGLETRANSLATE)	52
ENCAM	61
ÇAVKANÎ	62

DESTPÊK

Adaptasyon ji her alî ve deverîkirin e. Adaptekirina navên lehengan, navên cih û waran, teswîrkirina li gorî zimanê berhem lê hatî adaptekirin, nermkirin an ji hişkirina taybetmendiyan lehengan, lêanîna erf û edet, rê û resman hwd. Wergêr an jî adapteker dema adaptasyon an jî wergerê bike divê li gorî hesesîyetên ciwakê tevbigere. Divê zimanê resen ê berhemê jî wekî zimanê xwe yê zikmakî baş têbigihê û bizane. Ligel vê divê wê civaka ku berhem lê hatî dayîn û tê de behsa wê hatî kirin jî baş bizane. Encex bi vî awayî ew dikare berhemê adapte bike û mirov di berhema adaptekirî de herdû civakan bibîne. Çawa ji bo nirxên civaka xwe rêzdar e divê ji bo nirxên civaka din jî rêzdar be. Çawa ku erdnigarî li ser jîyana giştî ya civakê bandorê bike, yek bi yek li ser kesayetan jî bandorê dike. Kesayet û civak li gorî heyînên erdnigarî (avhewa, heyînên serzemîn) û yên civakî (çandî, bawerî, debara aborî) jîyana xwe bi rê ve dibin. Sedemê cudabûna civakan, ji sedemê cudabûna van heyînan diqewime. Ev cudabûnên hanê - bêtir yên civakî- carinan dike ku di navbera du civakan de cudabûnên gelek mezin pêk bîne. Girîngiya werger an jî adaptasyona berhemeke ji demeke wisa de diyar dibe. Wergêr û adapteker van cudahiyan divê bi hostaiyek, pisporiyek wisa mezin ji holê rake ku hem orijînalîteya berhemê xera nebe hem ji berhem wisa bixuye ku, heçko mirov ji nû ve nivîsandî.

Wergêr û adapteker ew berhema ku li ser bixebite divê di gelek waran de bêjîng bike. Girîngiya vê yekê, nivîskarê tirk Namik Kemal bi vî awayî tîne ziman: “Li ser rûyê erdê welatê mirov, mîna xaniyê mirov ê bajarekî de ye.”¹ Çawa ku mirov ji mala xwe re çî bistîne, dibijêre, divê tiştê ji bo welatê jî bistîne, bibijêre.

¹ (Ahmet Vefik Paşa Adaptasyonlarında Kültürel Sentez ve Edebi Eser Çevirisi, Hüseyin Doğramacıoğlu, 2009, 1077, , Turkish Studies, International Periodical for the Languages, Literature and History of Turkish of Turkic Volume 418 Fall 2009)

BERAWIRDKIRINA “NIVÎSKAR Û ŞEYTAN” Û “NIVÎSEVAN”

Çîroka “Nivîskar û Şeytan” ji aliyê Maksîm Gorkî ve cara pêşîn sala 1899an de di kovara “Jiyan” de hatiye weşandin. Dr. Kamîran Alî Bedirxan jî ev çîrok di kovara “Hawar”ê de, hejmara bîst û didoyan de (22), rûpelên du û sisêyan de weşandiye.

Nivîskar, mijara çîroka xwe ji hevaltiya demkî ya Iblîs û kesekî ku Iblîs wî ji gorê derdixe, distîne. Iblîs, karaktereke hem di edebiyata Rojava hem jî di ya Rojhilat de derdikeve pêşiya me ye. Fausta Goethe û Bersîsê Abida Feqiyê Teyran mînakên berbiçav in. Jixwe nivîskar (Gorkî) jî di çîrokê de behsa “Iblîs” ê Goethe dike: *(Ev ew şeytan e ku, ew ê Gotheyê mezin bi me re dayî nasîn, Iblîsê herî baş ê ji aliye me ve tê zanîn e.)*

Şeveke payiza reş û tarî de bêhna Iblîs teng dibe. Dixwaze mijûlahiyeke ji xwe re bibîne ku şeva xwe pê derbas bike. Diçe goristana bajêr, li ser tirba nivîskarekî ku ji berê ve ew nas dikir û wî ji gorê dide rakirin. Dest bi gerê dikan. Bi diyalogên di navbera herduyan de iblîs acziyeta mirovan radixe berçavan û tinazê xwe bi vê yekê dike.

Mijar: Iblîs nivîskarekî mirî ji gorê radike û şeveke di nava kolanên bajêr de digerin. Axaftinên di navbera iblîs û nivîskar de “şeytaniya” iblîs û fikar û endîşeyên nivîskar derdikevin pêşber xwendevanan.

Karakterên Çîrokê: Di çîroka resen de iblîs, nivîskar, hevjina nivîskar û mêrê wê ne.

Iblîs: Ligel “nivîsevan” karaktere sereke ye. Dilê wî teng dibe û dixwaze şeva xwe bi axaftin û galegalê biborîne. Li ser vê yekê li goristana bajêr nivîsevanekî mirî ji gorê hişyar dike.

(Iblîsê Gorkî û yê Kamîran Bedirxan ji hev cihê ne. Ê Gorkî dixwaze tinazê xwe bi nivîskar bike û bi xemgîniya wî kêfxweş bibe. Ê Kamîran Bedirxan bes dixwaze diltengiya xwe varî bike û bi “şahiya” nivîsevan “dilxweş” bibe.)

Nivîsevan: Karakterê ku navê xwe daye çîroka adapte ye. Ji bo welatê xwe xebitiye û bi vê dilxweş e. Tirs û endîşeyên mirovekî bîndest (diyaloga dema ji gorê radibe) lê peyda ne. Di nivîskarê Gorkî de bêtir endîşeyên edebî (peyvên rexnegir, sansür) û yên malbatî (zewaca nû û kêfxweşiya jina wî û hizra pêşeroja zarokên wî) derdikevin pêşberî mirov.

Têkiliya (Hevşibî-Cihêti) Herdû Çîrokan:

Herdu çîrok jî bi teswîra demsala payîzê dest pê dîke:

“Jîna paîzê bê reng û tam e, ji lewre dema werihan û mirinê ye.

Rûjên cûn, ezmanên bêroj, şevên reş çiqas nexweş in.

Bayê qûvî li ba dibe, sih qûr û sar e Ewrên giran û tarî di ezmanan de digerin sihên wan dikevin dilên mirovan û dilê wan tehl diqin.”²

“jiyana payîzê ya di demsala mirinê û zer û çilmisokî de çiqas dijwar e.

Rojên cûn, ezmanên bêroj û bi girî, şevên reş û tarî, bayên stranên bikovan dibêjin, sihên payîzê –ew sihên ku reş û tarî; ev hemû, tiştên tarî û nezelal tînin bîra mirovan...³

Piştî vê destpêkê Gorkî iblîsî teswîr dîke lê ev, di ya K.Bedirxan de nîne. Heta di ya Gorkî de telmîh heye. Goethe û “Faûst” a wî tîne bîra xwendevanan.

Rewşa iblîs a berî diçe goristanê tê teswîrkirin:

“Rûjeqê ji rûjên paîzê dile Iblîs teng bû ji xwe re got ezê herim gornistanê yeqî ji miriyan ji xewa wî hişyar biqim û pêre baxêvim û weq gotina xweqir û çû gornistanê û ser tirba nivîsevanekî seqinî...”⁴

² Kamiran Bedirxan, “Nivîsevan”, Hawar, j.22., rp.2, Şam, 1932)

³ GORKI Maksim, Hikayeler, Werger: Hasan Ali Ediz, Weşanxaneyê Cem, Stenbol, 2012, rp. 451

⁴ Kamiran Bedirxan, “Nivîsevan”, Hawar, j.22., rp.2, Şam, 1932

“Di tariya şevêkî payizê de Iblîs, goristanê, di nav goran de digeriya. Bêhna wî teng bibû, fîtik lê dixist û li derdora xwe dinêrî ku ji xwe re şahiyekê bibîne.”⁵

Gorkî di teswîra goristanê de behsa sembola isewîtî “xaç(ên reş)” dîke lê ev, di ya K.Bedirxan de nîn e. Ev, aliye adaptasyonê yê serketî ye.

Dema Iblîs diçe li ser gora nivîsevanî, ev diyalog di navbera wan de dibore:

“Ho! Guhbide min! Ji cihê xwe rabe! Ji gorine dengeqî kebe lê vegerand?”

Ji bo çi ezê ji tirba xwe rabim.

-Divê tu ji tirba xwe rabî!

-No ez ji tirba xwe ranabim!

-Çima?

-Ma bêje tu qiyî.

Tu min nasdiqî

-Waliyê tirqo?

-Ha... ha... ha no... ez ne ew im.

-Belqo tu qomandarê esqeriyî.

-No... no... te dîsan sehneqir.

Ma kî yî bibêje...

Ez Iblîs im:

⁵ GORKI Maksim, Hikayeler, Werger: Hasan Ali Ediz, Weşanxaneyê Cem, Stenbol, 2012, rp. 452

-qo wisa ye baş e, zuqa tēm.”⁶

Diyaloga di çîroka Gorkî de jî wiha ye:

“Hê, li min binerin” got, “rabin!”

Ji binê erdê dengekî fetisokî hat bihîstin:

“Ez ê çima rabim?”

“Divê hûn rabin!”

“Ez ranabim.”

“Çima?”

“Ma hûn kî ne?”

“Hûn min dizanin!”

“Nebe ku hûn sansür bin?”

“Na!”

“Nexwe dibe ku hûn polîs bin?”

“Na, na!”

“Ma hûn ne rexnegir in?”

“Ez Iblîs im.”

“Waa! Ez ê niha rabim.”⁷

⁶ Kamiran Bedirxan, “Nivîsevan”, Hawar, j.22., rp.2, Şam, 1932

⁷ GORKI Maksim, Hikayeler, Werger: Hasan Ali Ediz, Weşanxaneya Cem, Stenbol, 2012, rp. 451

Dema derketina “nivîsevan”î ji gorê jî tê teswîrkirin hevşibî diyar dibe:

“... *Qet ji cihê xwe kelikî axê xwe veqir û hêdî hêdî cendeqê zelumî ê hestî ango keltaxê wê ji erde derqet.*”⁸

[Kamiran Bedirxan, di vê parçeyê de ji bo “**zelamî**” cînavka “**mê**”yîtiyê (**wê**) bi kar aniye.]

“*Kevirê ku li ser gorê, ji cihê xwe qeliqî. Ax qelişî. Qerqûdeyek ji nav derket...*”⁹

Piştî derketina qerqûdeyî ji gorê, diyaloga wan wiha berdewam dike:

“*Iblîs jê re got:*

-Rûja te xweş be. Nivîsevanê lê vegerand:

(Dîsa cînavka “**mê**”yîtiyê heye. Mirov vê yekê wekî nezanîna K. Bedirxan bibîne, dê ji bo wî neheqiyeye mezin be. Ez xeletiya çapê û ya çapkerî ye.)

-Ez niqarim selawa te li te vegeînîm. Mirî gelek nizm digot û denge wî ecêb bû key du hestî hev digemirandin.

Şeytên got:

Mêze kisûra min meq e min nediviya ez selawê li te biqim.

-Xem tune... lê dixwazim bizanim... te çima ban min qir?

-Min ban te qir ji lewre min ji xwe re digot, emê herin bigerin!

-Çaqe... ger jî hewa ne hevkas spehî ye.

-Tu ji sermaye natirsî?

-No, bi xwedê ez natirsim... min di jîna xwe de gelek serma hilanî.

-Belê ... niho tê bîra min, te serma hilanî, ne sax qetî û wisan mirî¹⁰.

“*Şeytan:*

⁸ Kamiran Bedirxan, “Nivîsevan”, Hawar, j.22., rp.2, Şam, 1932

⁹ Maksim, Hikayeler, Werger: Hasan Ali Ediz, Weşanxaneya Cem, Stenbol, 2012, rp. 453

¹⁰ Kamiran Bedirxan, “Nivîsevan”, Hawar, j.22., rp.2, Şam, 1932

“Ji bo ku hûn derketin bijîn.” got.

Nivîsevanî bi kurtasî wiha bersiv da:

“Aha ez nikarim wê bikim.”

Bi dengê ewqasî nizm û ecêb diaxivî, te digot qey du hestî bi awayekî ku bi zehmetî tê bihîstin li hev dikevin û dikin zîqînî.

“Ji biwêja ku min bi kar anî li min biborin.”

“Tika dikim. Lê ji ber çî we ez rakirim?”

“Min dê pêşniyazek li we bikira, ji bo em bi hev re piçekî bigerin. Ji xeynî wê tu mebesta min nîn e.”

“Waa! Bi kêfxweşî ez ê vê pêşniyaza te qebûl bikim. Lê hewa gelek xerab e...”

“Ez dibêjim gerek hûn ji sermaye netirsin?”

“Na, na... Jixwe hêj di jiyana xwe ya li ser rûyê erdê de min gelek caran serma hilaniye.”

“Belê, tê bîra min. Dema ku hûn mirîn laşê we wekî cemedê bû.”¹¹

Di teswîra rewşa goristanê de dîsa “xaç” xuya nabe, di ya Kamiran Bedirxan de:

“Li tenîştî hev bi rê ve diçûn.

Baraneqe hûr dibarî û bayeq dihat li hestiyên ser û perasûyên nivîsevanî re derbaz dibû qo êdî dileq tê de nedilivî. Ji qortiqên çavên nivîsevanî roniyeqe heşîn derdiqet, diqet erde û rêya Iblîs rondar diqir.”¹²

“Di nava gor û xaçan de, di riya teng de, bi hev re dimeşîyan. Ji nav çavên nivîsevanî du ronahiyên şîn diket erdê û riya Iblîs ronî dikir. Xunavoka dibarî ew hêdîka şil dikirin, ba ji nav wî sîngê nivîskar ê ku êdî dil tê de neyî û parsûyên wî yên tazî re, bi serbestî derbas dibû.”¹³

¹¹ Maksim, Hikayeler, Werger: Hasan Ali Ediz, Weşanxaneya Cem, Stenbol, 2012, rp. 454

¹² Kamiran Bedirxan, “Nivîsevan”, Hawar, j.22., rp.2, Şam, 1932

¹³ Maksim, Hikayeler, Werger: Hasan Ali Ediz, Weşanxaneya Cem, Stenbol, 2012, rp. 454

Diyaloga wan piştî qerqûde ji gorê derketî didome:

“Nivîsevanî ji şeytên pirs qir?”

-em diçin bajêr?

-Qo dixwazî serseran . qeyfa te tê?

-çawan nayê?

-ma di bajêr de çi heye qo nîzikî dile te ye?

-mirov

-Çima

-Çi bêjim... ez çikas ji bo wan xebitîme.

Iblîs diqenî û qeyfa wî dihat û digot:

-Insanê reben!

-Hem reben hem bextiyar!¹⁴

“Nivîskarî ji Iblîsî pirsî:

“Em diçin bajêr, ne wisa?”

“Li wir çi heye ku bala te dikêşîne?”

Nivîskar bi awayekî guhnedêr bersiv da:

“Jiyan heye, ezbenî.”

“Waa!... Nexwe hêj wateya jiyanê heye ji bo we?”

“Ma tu çi dibêjî?...”

“Lê belê çima?”

“Ma ez çi bibêjim? Mirov hemû tiştî bi keda ku xerckirî re dipêve. Bo nimûne heger kesekî kevirek ji rêzê ji serê Çiyayê Araratê (gerek ev teferûata kurdî, ya ku wan deman de di rojevê de cihek girîng û zêde digirt li gorî qene'eta min, di çîroka Kamiran Bedirxan hebûya) anîbe, ev kevir ji bo wî kesî kevireke pîroz e.”*

Iblîs kenîya û got:

“Mirovê reben!...”

Nivîsevan bi rûsarî li dijî wê derket:

“Di heman wextî de mirovê bextiyar!”¹⁵

Di vê beşê de jî xuya dibe ku hin kitekitên biçûk de jî hevşibiyek heye:

“Iblîs milê xwe dikelikand.

Ji gornistanê derqetî bûn, li ber pêyên wan de rêyeqe pehn xwe dirêj diqir, di her du rexên rê de avahiyên mezin bûbûn rêz. Rê tarî bû, ronîya fanosên rê hindiq bûn wê qêmaniyê, qêmaniya ronîya dinê eşqere diqir.¹⁶

“Iblîs bi bédengî milê xwe hejand:

Ji goristanê derketibûn. Li pêşiya wan kolanek û di her du aliyên kolanê de du rêz xanî hebûn. Di nav xaniyan de jî ronahiya fanûsên rê yên qels, ji wê taritiya xwezayî re şahîdî dikir.”¹⁷

Kamiran Bedirxan di vê beşê de bi awayekî serkeftî kolonyalîzm û dijberiya tirkan bi cih kiriye. Ixtîmaleke mezin ji ber kêmxwendin û edebiyat û felsefeya rojavayî ya di nav civata kurd de, xwe ji bikaranîna hinek têgehên vedaye. Wekî “sembolîzma kindar” û “edîtor”.

“Iblîs dîsan pirsqir...

-de bêje.. di gorinê de tu çawanî, tu çawan li xwe dihesî.

-Niha qo ez tê de hînbûme, ne xerab e. rahet û bêdenge, lê dizanî despêqê de giran û geleş dişwar bû. Wî qerê girêdayî, tabûta min bismar qirî bû bismareq di mejiyê min de jî qutabû.

Dizanim qo ne tişteqî giran e lê pê geleş aciz dibûm.

¹⁴ Kamiran Bedirxan, “Nivîsevan”, Hawar, j.22., rp.3, Şam, 1932

¹⁵ Maksim, Hikayeler, Werger: Hasan Ali Ediz, Weşanxaneya Cem, Stenbol, 2012, rp. 455

¹⁶ Kamiran Bedirxan, “Nivîsevan”, Hawar, j.22., rp.3, Şam, 1932

¹⁷ Maksim, Hikayeler, Werger: Hasan Ali Ediz, Weşanxaneya Cem, Stenbol, 2012, rp. 455

Min ji xwe re digot ew bi kesdê wilo çêbû, min bi eklû mejiyê xwe îşê pir zelaman xirab diqir û dixwestîn mejiyê min jî xirab biqin. û paşê qurm peyda bûn. ew jî îşeq . Ez hêdî hêdî dixwarim... gelec hêdî. Iblîs digot:

-gotina te ye... Wisa dixwin, ma çî dixwazî , ew goştê tehl û weq zirav jî zû nayê xwarin.

-Lê dizanî cendeqê min jî ne tiştîq bû, goştê wî gelec qêm bû!

-Tirq ji goştê we zeydetir hezdiqin ne holê ye?

-Belê gotina te ye. ma çawan nizamim, ew goştê me û gundê me û hertiştê me hemî bi hev re zû dixwin!

-Pehîzê de gorin çawa ye, hêmî ye?

-Belê..ne bê hêmî ye, lê mirov lê fêr dibe. Lê heq rastiyê dixwazî ez ji hemî tiştan zeydetir ji wan ehmeke aciz dibim qo tên û ser tirban de digerin û ser tirba min de radiwestin,

Lê dizanî ez nizamim ji qî wextî ve ez mirî me, êdî wext çî ye sehnaqim

-Ev çar sal in tu di axê de yî nizîqe bibin pênc.

-Holê ye? di vê navbirê de sê zilam hatin ser tirba min rawestan yeqî ji wan navê min xwend û digot naveqî wisa min tucar ne bihîstîye. Niq dilê min di vê gorinê de qes veşartî tune.

Çawa bibêjim dile min gelec aciz bû. ez çend salan ji bo welatê xwe xebitîme, piştî vê xebatê yeq têt ser tirba min û dibêje min navê vî zelumî tucaran nebihîstîye û ji gotina wî derdiqeve qo ez di gorna xwe de ne veşartîme .. ma tiştên wisa tên qişandin.

Yê din navê min nasdiqir lê wî jî digot qo min xulamîtiya tirqo qiriye bila cihê min bibe dogeh. Yê paşî digot ew çikas bê ekl bû jîna xwe ji bo serxwebûna Qurdistanê xelas qir.. Her tengiyê de ma û wisan bê pere mir, qitêbên wî niho di gund û bajarên Qurdistanê de tên xwendin, herqes hej wî diqe lê mirî ji pesnên xelqê û ji hejqirina wê bê hay e.

Divîya bû jîna xwe di xweşiyê de biborîne.”¹⁸

“Piştî bédengiyê kurt Iblîsî dest bi axaftinê kir:

“Ê de ka bêje heyran, rehetî te çawa ye di gorê de?”

¹⁸ Kamiran Bedirxan, “Nivîsevan”, Hawar, j.22., rp.3, Şam, 1932

“Piştî ku tû hûn bûyî ne xerab e, gelek aram e... Lê hûn dizanin, berê gelek wêran bû. Ew kerê devê tabûtê bizmar kirî, ew bizmar li serê min de kutabû. Ne tişteki girîng e, lê dîsa jî ez pê aciz bûm. Hûn dizanin, ez vê helwestê wekî simbolîzmek kîndar dibinim. Teşebûsa xirakirina mejiyê min, ê ku carinan dixwest hinek tiştinên mirovan bihilweşîne, xwiya bû li min. Piştî kurmên axê hatin. Bila ji min dûr bin, wan hêdî hêdî mejiyê min dixwarin.”

Şeytan:

“Bêguman!” got. “Ji ber vê yekê ne baş e tu wan sûcdar bikî. Laşek bi ziravî dagirtî, ez dibêjim qey gerek ne porsiyonek tehmxweş be.

Nivîskar li dijî vê yekê derket:

“Ma heçko laş bi min ve mabûbû?”

“Lê dîsa çawa be, piçek hebû! Kurm vî karî ji zewqstendinê bêtir wekî peywireke ne jidil dibînin. Lê ligel vê çendê zûtir û bi hezkirin dixwin...”

“Ev tişteki normal e... bi ixtîmaleke mezin goştê wan tehmdartir e.”

Şeytan pirsîya:

“Di payîzê de gor çawa ye, hêmi ye?”

“Hêmi ye. Lê mirov dielime. Heger hûn rastiye bixwazin, tişta ku min ji hemûyan bêtir aciz dike ew e ku; dema hinek kêmaqil li goristanê digerin, bi tesadûfî tèn li ser gora min disekin. Ez nizanim ev çiqas e li binê erdê de radizem. Ji ber ku hem ez hem jî hemû tiştên li derdora min di rewşeke rawestayî de ye, ne pêkan e ku hişê min ji wateya demî bigire.”

Şeytan got:

“Ev çar sal in ku hûn di bin axê de radizên. Gelek nemaye dê bikeve sala pêncan de...”

“Rastî? Wey tu lê biner! Di vî demî de sê kes hatine li ser gora min. Xwedê belayê bide wan, wan ez gelek aciz kirim. Yekî ji wan bi eşkereyî hebûna min înkâr kir. Dema hat nivîsa li ser kêla min xwend bi sonda temam got: “Zilamekî wiha tunebû.” Min nivîskarekî bi vî navî di heyata xwe de ne xwendîye. Navê wî li min biyanî nayê. Di xortaniya min de, li taxa me, bi vî navî zilamek hebû ku sindoqeke veşartî ya deyndayîne

hebû.” *We dît, çawa çêbû? Hâlbûkî tam şazdeh salan di kovarên ku herî zêde tên xwendin de nivîsên min derketin. Qasê ku ez li ser rûyê erdê her berhemeke min sê caran çap bûn.*”

Şeytan got:

“Piştî mirina we jî berhemên we du caran hatin çapkirin.”

“ We dît? Piştî du kes din jî hatin. Yekî ji van got: ‘Ew bi xwe ye!’ ‘Erê di dema xwe de ew jî dixwendin.’ ‘Hemû kes tên xwendin.’ ‘Vî zîlamî fikren çawa telkîn dikir gelo?’ ‘Bi giştî qencî... Xweşikî û fikren her wekî din telkîn dikir.’ ‘Erê, erê tê bîra min.’ ‘Zimanê wî piçek bi teşeyî bû.’ ‘Gelek ji van di binê axê de radizên.’ ‘Erê, axa Rûs ji aliyê behreyê ve gelek dewlemend e.’ Piştî van gotinan gayên Xwedê, cihimîn û çûn. Ez dizanim gotinên germ, germiya gora min bilintir nake. Lê dîsa çawa be li zora mirov diçe. Hem dilê min ewqasî xwest ku ez dijûnan li wan bikim.”

Şeytan kenya:

“Nexwe, te ew di nav çêran de bihiştana!”

“Na... Hûn dizanin, ev, dê piçekî ecayîb bibûya. Di beriya sedsala bîstan de sixêfkirina miriyan dê tiştêkî seyr bibûya. Piştî dê ev yek li ser hesabê materyalîstan derbeke giran bihata dîtin.”

Bêhna şeytan dîsa teng bû.

“Vî nivîskarî di saxiya xwe de dixwest bibe zavayê her dawetê û mirîyê her ayîna cenazeyê. Niha jî her çiqas hemû tiştên di hundirê wî de xera bûbe jî dev ji meraqdariya navdariyê bernade. Heçko çi qedr û qîmetê mirov heye li cem jiyanê! Tiştê girîng tenê giyana mirov e. Ev mirov çiqas heyînên acizker in!”

Tam, dê şeytan ji nivîskarî bixwesta biçe gora xwe de, di hundirê sere wî yê tijî xerabî de fikreke şewq da. Vê gavê di qadekê de bûn. Her çar dora wan bi girseyên mezin ên xaniyan girtîbûn. Ezmanekî şilûreş ê bi ewrên nizm ve hatî dorgirtin raserî qadê pêçayîbû. Ezmên heçko xwe li ser banên xaniyan berdayîbû.”

Şeytanî bi naziktiyeke mezin xwe ber bi nivîskar ve tewand û jê re got:

“Li min guhdarî bikin, ma hûn naxwazin bibînin ka jina we çi dike, çawa dijî?”¹⁹

Di vê beşê de jî hevşibiyên mezin hene.

Bo nimûne: bizmarkirina serê nivîskar, nêrîna wî ya di derheqê vê bûyerê de, peydabûna kurman, xwarina wan a goştê tehl, hêmîbûna gorê, hatina li der gorê ya sê kesên ku nêrîna wan ji hev cuda.

Lê belê ligel van hevşibiyên Kamiran Bedirxan di riya mehelîkirina çîrokê de hinek xalên ku niha jî tîn nîqaşkirin, lê cih kiriye.

Li gor rewşa siyasî ya ku tê de dijîn -vê rewşê bandorek mezin li kovara Hawarê jî kiriye û nêrîna siyasî ya çîrokê û kovarê paralel in- hinek guhertin û lêzêdekirin jî hene.

Zulkuf Ergun, di gotara xwe ya bi navê “Gotara Dijkolonyal Wêneyê Serdestiya Tirk di Kovara Hawarê de” dem û rewşa ku Hawarê dest bi weşanê kirî wiha teswîr û analiz dike:

“Kovara Hawarê di encama dabeşkirina Kurdistanê û serkutkirina her du serhildanên Şêx Seîd û Agiriyê de derdikeve. Damezirîner û nivîskarên Hawarê, piştî van şikestinên siyasî, bi riya edebiyatê balê dikêşin ser rewşa kolonyal a Kurdistanê û li dijî desthilata dewleta Tirkîyeyê bi gotara xwe ya dijkolonyal derdikevin pêş. Damezirînerê kovarê Celadet Alî Bedirxan xwedan roleke sereke ne di berçavkirina gotara dijkolonyal a Hawarê de.

...

“Nivîskarên Hawarê, Kurdistanê di nav rewşeke kolonyal de pêşkeş dikin. Dewleta Tirk bi hemû hêza xwe ya serkutker êrîşî ‘gund’ û bajarên kurdan dike.

...

“Dewleta Tirkîyeyê û kesayetên tirk, wek dagirkerên Kurdistanê xwedan wêneyekî nerînî ne di Hawarê de. Dewlet bi amrazên xwe yê zext û jinavbirinê li ser hebûna

¹⁹ Maksim, Hikayeler, Werger: Hasan Ali Ediz, Weşanxaneya Cem, Stenbol, 2012, rp. 455

kurdan û welatê wan metirsiyeke mezin çê dike. Kesayetên tirk ên ku di deqên edebî yên Hawarê de cih digirin yan leşker in ya jî rêvebir in.

...

“Nivîskarên Hawarê hilweşandina hukmê kolonyal di geşkirina hişmendiya neteweyî de dibinin. Ji bo çê kirina vê hişmendiye jî hewl didin rûdanên trajîk ên sitemkariya li ser kurdan berçav bikin û bi riya van kesayetên hişyar hêz bidin berxwedanê. Ji ber vê, hemû kesên edebî yên Hawarê wek nûnerên neteweyêke bindest ji bo hişyarkirina endamên neteweyê wek kesayetên nimûneyî hatine hilbijartin.”²⁰

Nurî Fîrat jî dibêje ku: *Pêvajoyên xweseriya netewe û pêşketina zimanî bi hev re dimeşe. Normal e, di van deman de argûmanên bi vî awayî di berhemên edebî de cih bigrin. Dema “pêvajoya avakirina neteweyê” û ligel wê “têkoşîna rizgariya neteweyê” ya kurdan a ku ji serê sedsala 20an pê ve bê ber çavan, dê xuya bibe ku tempoya pêşveçûna berhemên edebî-çandî ji ya van pêvajoyan ne pêkan e bê cudakirin...²¹*

Herwiha ev bikaranînên bi vî awayî di edebiyata kurdî de pir zêde ne. Mînaka herî berbiçav Mem û Zîna Ehmedê Xanî ye. Wî xweseriya ziman û neteweyê ji hev cuda nedidît û li gor wî qedera wan heman tişt e.

Hevşibiyek gelek mezin di navbera îfadeyên Kamîran Bedirxan û ya Îhsan Colemêrgî de hene. Îhsan Colemêrgî çîroka gelêrî ya ku li herêma Botan û Colemêrgê tê zanîn û gotin; ”Cembeliyê Kurê Mîrê Hekaryan” nivîsandiye. Di vê romanê de jî ev îfade balê dikişinin ser xwe:

“Rastî jî yekîtiya kurmancan ji bona me ji numêja subê jî ferztir e. Welatê me serxet e. Tuxûbê du dewletên zordest de ye. Qedîm de kêşvekêşa wan e li ser xakê me. Hem

²⁰ ERGUN Zulkuf, “Gotara Dijkolonyal Wêneyê Serdestiya Tirkan di Kovara Hawarê de” Remezan ALAN û Ergin ÖPENGİN (Edîtor), Tîr û Armanc, Weşanên Peywend, Stenbol, 2014, rp. 45-46

²¹ FIRAT Nurî, “Ceribandinek Li Ser Edebiyata Kurdî: Edebiyata Polîtîk An Edebiyata Polîtîkayê” , Vecdî ERBAY (Berhevkar), Înatçî Bir Bahar, Weşanên Ayrıntı, 2012, Stenbol, rp. 426

îranî hem jî Osmanî qedîm de dijminên bav û kalên me ne. ‘Xwîna kurdan pîr li wan wxeş dihêt.’” (rp.71)²²

Belê gotîna te ye. ma çawan nizanîm, ew goştê me û gundê me û hertiştê me hemî bi hev re zû dixwin!²³

Di hatina sê kesan a li ser gora nivîskar de ji aliyê fikr û gotinên xwe ve hinek cudahî hene. Bo nimûne kesê yekem di çîroka resen û ya adapte de xwediyê heman fikrê ne: “*Di vê gorê de tu kes nîn e.*” Ango heyîna wî tê înkarkirin. Lê belê kesên duyem û sêyem de bi temamî ji hev cuda ne. Di çîroka resen de her du kesên dawiyê navê nivîskar nas dikin lê wî bêkêr dibînin. Ev jî li zora nivîskar diçe. Di çîroka adapte de di navbera fikrên kesê duyem û sêyem de nakokiyên mezin hene. Tiştê li pêşber mirov e lê yek “spî” dibine, yek “reş” dibine. Dîtin û nêrîna wan tam li dijî hev in.

Yek dibêje “*wî xulamtiya tirko kiriye*” yê din dibêje “*wî jîna xwe ji bo serxwebûna Kurdistanê xelas kir.*” Dijîtiya wan her du nêrînan zeîfîya vehanê nîşan dide. Lihevanîna Kamiran Bedirxan qels maye.

Kamiran Bedirxan behsa qedera bêyom a nivîskar û rewşenbîrên kurd jî dike. Qedera ku hem pêşîya wî hem jî piştî wî tije sirgûn, xizanî, êş û azar... Di lîteratûra kurdî de dema behsa sirgûn û bêriya welat bê kirin kesên pêşî bîn bîra mirov malbata Dr. Kamiran bi xwe ye: Bedirxanî, malbatek ku eneq evqas bikare di dîroka ronakbîrî ya neteweya xwe de cih bigre. Ew jî wekî endameke vê malbatê ji vê bextreşiyê bêpar nemaye. Ew li sirgûnê ye dema vê çîrokê adapte dike. Birayê Mîr Celadet Bedirxan ê ku bingehe alfabe ya kurdî ya latînî danî jî li gel wî ye. Di rûpelên Hawarê de behsa bêderfetiya ku tê de ye, dike. Ev îfadeya di vê beşe de heçko taybetî ji bo birayê xwe û bi giştî jî ji bo rewşenbîrên welatê xwe gotiye: “Her tengiyê ma û wisan bê pere mir.” Mirina Celadet Bedirxan a trajîk bûye mijara romana Mehmed Uzun a bi navê “Bîra

²² ALAN Remezan, Bendname, Weşanên Avesta, Stenbol, 2012, rp. 131

²³ Kamiran Bedirxan, “Nivîsevan”, Hawar, j.22., rp.3, Şam, 1932

Qederê” jî. Wî ji bo debara mala xwe bike dest bi çandiniya pembû kiribû û ji bo avdaniyê jî bîrek kolaye. Ew bîr jî bûye sedema mirina wî.

Nivîskarên Hawarê yên ji nifşê Kamiran Bedirxan; Osman Sebrî, Cegerxwîn, Qedrîcan û Nûredîn Zaza jî sirgûn in û ji welatê xwe dûr, di nav zoriyê de dijîn. Mixabin rewşenbîriya kurdî ji vî aliyê ve dewlemend e û mînakên wê pir in. Selîm Temo di nivîseke²⁴ xwe de behsa hinek navên ku di demeke jiyana xwe sirgûnê dîtîn dike: Abdulla Peşew, Cegerxwîn, Enwer Mayî, Ferhad Helmed, Medenî Ferho, Mela Ehmedê Xasî, Mele Eliyê Beroşkî, Mîr Celadet Bedirxan, Mîr Kamiran Bedirxan, Osman Sebrî, Refîq Sabir, Qedrîcan, Rênas Jiyan, Rojen Barnas, Şêrko Bêkes, Şêx Es’edê Erbîlî, Şêx Mihemed Kerbelayî...

Em jî dikarin hinek navên din lê zêde bikin: Mahmûd Baksî, Mehmed Uzun, Hesênê Metê, Firat Cewerî; dengbêj û stranbêjên navdar, Meryemxan, Mihemed Arifê Cizrewî, Eysê Şan, Şakîro... Her çar navên dawiyê li sirgûnê jiyana xwe ji dest dane. Heya sê navên dawî di nav xizaniyê de û bê kes û kûs mirine.

Dîsa Hacî Qadirê Koyî yê ku di edebiyata kurdî ya nûjen de cihek mezin digre û bi navê “Xaniyê Duyem” tê nasîn – li sirgûnê mamostetiya taybet a zarokên Bedirxaniyan jî kiriye- di sala 1897an de li Stenbolê dimire û li Skûdarê di Goristana Qerece Ehmed de tê veşartin.

Beşa dawiya ya çîrokê Kamiran Bedirxan wiha girê dide:

“Wextê qo qetin nav bajêr de Iblîs guhdariya dengeqî qir û ji nivîsevanî re got bibihîse.

Nivîsevanî guhda û bihîst şagirtên dibistanê yek ji şîhrên wî distran, pe geleş dilxweş bû û dîsa dest bi meşe qirin.

²⁴ TEMO Selim, (2007), Modern Kürt Şiiri ve Sürgün, *Esmer*, 28, rp.40

Xelq li ber qitêbxaneyên mezin qom bû bûn, qetin nav wan de û nivîsevanî dît qo yeq ji qitêbên wî bi herfên zîv û zêr çapqirî peşberê xelqî de ye, xelq bi çavên geş lê dinêrîn û herfên qitêba wî weq stêran dityisîn.

Qo Iblîs şahîya wî dît pê dilxweş bû û jê re got:

-Dixwazî em herin durtir; nivîsevanî got:

-No.. Naxwazim, dixwazim bizivirim ser tirba xwe, min dît qo bo min mirin nîne.

Vegea xwe de dîsan dibihîst qo zaroyên Qurdistanê şîhrên wî dixwînin.²⁵

Lê girêdana çîroka resen, ji ya adapte cudatir e. Iblîs nivîskarî dibe mala jina wî ya ku piştî mirina wî li gel dezgehdarkî re zewicî. Kêfxweşî û bextewariya wan dibîne û bi vê yekê hem diheside hem jî li ber xwe dikeve.

Di dawiya dawiyê de jî wekî beşek cuda di derheqê jiyanê de hinek şîretan li xwendevanan dike.

Beşa dawiyê ya çîroka adapte, bi xwerû ya Kamiran Bedirxan e. Bi vê beşê hem xeyal û hêviyên xwe hem jî yên hemû nivîskar û rewşenbîrên kurdî nûs ji nava dilê xwe rijandiye li ser kaxezê. Lewra kesekî/e nivîskariya zimanekî ji aliyê edebiyatê ve di xetereyê de ye bike; wê xeyal û hêviyê dike ku ew tim û daim bê xwendin, neye jîbîrkin û neteweya wî minetdarê wî be. Ji ber ku wî riyek tijî strî daye ber xwe û daye pey wê riyê. Ji aliyê payîdariyê ve –ji bo nivîskarekî- ev rîskeke mezin e. Wî barek giran hildaye ser milên xwe. Ew erkeke netewî tîne cih. Û divê ev, bê dîtin. Di dema Kamiran Bedirxan de, rewşa xwendinê ya di nav kurdan de ji dema Ehmedê Xanî gelek cuda nîne. Wî jî bi nivîsandina kurdî hem erkeke neteweyî aniye cih, hem jî rîskek mezin standiye. Lewra Ehmedê –ji berhemên wî jî diyar e- dikaribûye osmanî, erebî an jî farisî binivîse. Ehmedê Xanî beriya nivîsandina Kamiran Bedirxan ya vê çîrokê 250 salan di Mem û Zîn û Dîwana xwe de behsa rewşa xwe ya tercîha kurdî dike. Heman rewş ji bo Kamiran Bedirxan jî derbasdar e.

“Çibkim ku qewî kesad e bazar

Ninin qumaş-i ra xerîdar” (Mem û Zîn)

²⁵ Kamiran Bedirxan, “Nivîsevan”, Hawar, j.22., rp.3, Şam, 1932

“Teb’ê Xanî sedefa gewherê ‘irfan e welê

Metnixwanek nebitin sahîbe me’na çi bikit? (Dîwana Xanî)²⁶

DI EDEBIYATA KURDÎ DE NIMÛNEYÊN ADAPTASYONÊ

Di edebiyata kurdî de di warê klasikan de jî adaptasyon derdikeve pêşberî me. Çirokên evînî yên wekî Leyla û Mecnûn, Yûsif û Zelîxa û Şêxê Sen’an çawa di edebîyatên rojhilat(navîn)î de hatibin nivîsandin, wersiyonên wan ji aliyê helbestvan û nivîskarên kurd, ên di dema mîrektiyên berhem dayîn de jî hatîne pê.

Leyla û Mecnûn: “Efsaneyek a ereban e. Di vê efsaneyê de behsa helbestvanê bi navê Qeys Îbnî Mulewwah (mirin 689 an jî 699) ê ku bi nasnavê “Mecnûn” helbestan dixwîne û keça ereb a bi navê Leylî(Leyla) (behsa serpehatîya evîna wan) ya bi veqetana herdu evîndaran bi dawî bûyî dike. Li gorî rîwayetê Qeys û Leyla dotmam-pismamê hev in. Hêj bi temenê biçûk de ji hevdû hez dikin. Helbestên Qeys ji bo Leylayê gotî li ser zimanan digere. Bavê Leylayê ji ber ku navê keça wî kiriye benîştê devê xelkê li dijî zewaca wan derketîye. Leyla di gel yekî din tê zewicandin, Qeys dikeve çolan; êdî wekî Mecnûn (dîn) tê nasîn. Leyla ji ber êşa vê veqetîne dimire; Mecnûn jî li ser gora wê dimire.

Ev efsane di sedsala 10. de di edebiyata erebî de berbelav dibe. Nesîr tev li helbestên kû tê gotin ên Mecnûn in dibin û ev efsane dibê çîrok.

Di edebiyata farisî de Nîzamiyê Genceyî(ss.12.) ev efsaneyê ji bo mesnewiya xwe wekî mijar bijartîye(1188). Nîzamî, di mijarê de hinek guhertin kiriye. Helbestvanên ku di edebiyata tirkî û farisî de ev mijar bi kar anîn bêtir li pey rêça Nîzamî çûne. Helbestvanên herî navdar ên di edebiyata farisî de ev mijar bi kar anîn ev in: Emir Xusrew (m. 1325), Camî (1414-1492), Mektebî (ss.16); piştî di zaravayê çaxatayî de Elî Şîr Newaî (1441-1501); di zaravayê ezerî de ji aliyê Fuzûlî (m. 1556) ve

²⁶ Mem û Zîn, Amadekar: Jan Dost, Weşanên Avesta, Stenbol, 2010, rp.30-31

hatiye nivîsandin. Di nav van de ya herî navdar berhema Fuzûlî (1535) ye.”²⁷ Edebiyata kurdî de jî Harisê Bedlîsî (ss. 18) Leyla û Mecnûn (1748 an jî 1758) nivîsîye.²⁸

Yûsif û Zelîxa: “Tiştên ku hatin serê Yûsif pêxember (avêtina birê ya Yûsifê kurê Yaqûp a ji aliyê birayên wî ve, ji ber ku li Misrê bersivê nade evîna qedexe ya Zelîxayê avêtina wî ya zindanê, şîrovevên wî yê xewnan ên di zindanê de, anîna wî ya li ser kar a di qesrê de, hevdiîna wî û birayên wî hwd.) di Qur’ana Pîroz de wekî “xweştirîna çîrokan” hatiye binavkirin û bi awayekî berfireh hatiye vegotin (Sûreya Yûsif ayeta 11.) Di edebiyata tirkî de helbestvanên wekî Alî (1232), Şeyat Hemze (ss.13), Sûlî Feqîh (dawîya ss.13.)ev mijar ji aliyê wê ya olî ve bi kar anîne.”²⁹ Di edebiyata Kurdî de jî Selimîyê Hîzanî (ss.18) û Harisê Bedlîsî (ss. 18) Yûsif û Zelîxa nivîsandîne.³⁰

Mem û Zîn: Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi xwe, ji çîroka gelerî ya kurdî Memê Alan hatiye girtin. Li ser vê re jî adaptasyonên wê hatine çêkirin.

“Adaptasyonên Mem û Zînê yê wekî filman:

Sinema:

Mem û Zîn (1991)-Derhêner: Ümit Elçi

Rêzefilm:

Memî Alan (2002)-Derhêner: Nadîr Hesên (Kurdistan TV)

²⁷ Leyla ile Mecnun(1986), Büyük Larousse Sözlük ve Ansiklopedisi (c. 14, rp. 7460). Milliyet Gazetecilik A.Ş., İstanbul: Lİbraire Larousse

²⁸ ADAK Abdurrahman

²⁹Yusuf ile Züleyha(1986), Büyük Larousse Sözlük ve Ansiklopedisi (c. 24, rp. 12648). Milliyet Gazetecilik A.Ş., İstanbul: Lİbraire Larousse

³⁰ ADAK Abdurrahman, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2014. Rp.290

Sîya Mem û Zîn (2012-...) Derhêner: Yusuf Güven (TRT6)³¹

Şêxê Sen'anî : “Çîroka Şêxê Sen'anê ku pêncî salan şêxîti kirî û xwediyê çar sed muridan, di mesnewîya Ferîdudîn Ettar a bi navê Mantiqû-t Teyr (1187) de derbas dibe.”³²

“Feqiyê Teyran jî menzûmeya Şêxê Sen'anî di sala 1030\1620î de nivîsandiye. Menzûme ji 362 bendan pêk tê. Menzûme behsa evîna şêxekî zahid ji bo keçeke Mesîhî ya Ermenî dike. Ev evîna dike ku şêx tekya û mirîdên xwe terk bike û biçê welatê evîndara xwe. Di encamê de şêx terka dîne xwe kiriye, xaç xistiye stûyê xwe û şivantiya berazên bavê mehbûba xwe kiriye. Piştî demekê dema ku şêx digihe ruşda xwe, herdu bi hev re Misilman dibin.”³³

Mewlîd: (Min ev nirxandinên di derheqê Mewlîdê de bi temamî ji Mufîd Yuksel standiye. Wekî Hawarê di vê de jî min dest bi rastnivîsa wî nedaye.) Nivîskar Mufîd Yuksel di nivîseke xwe ya tirkî de [Molla Hüseyin El-Batevî ve Kürtçe Mevlid-i Şerîfî(Mela Hisên Bateyî û Mewlîda Şerîf a Kurdî)] behsa têkilî -û bêtir- hevşibiyên mewlîda Bateyî û Silêman Çelebî dike:

“Mewlîd cara pêşî ji aliyê hevalê Bedîûzeman Se'îdê Norsî yê nêzîk Ehmed Ramîz ve di sala 1324an de li Qahîreyê hatiye çapkirin. Piştî sala 1327an de dîsa ji aliyê Mihemed Şefîq El-Erwasî ve li Stenbolê di çapxaneyê Ehmed Kamil de hatiye çapkirin. Mewlîd, ji bilî van çapan, çend carên din jî çap bûye, di sala 1996an de li Dihokê ji aliyê Tehsîn Brahîm Doskî û Muhsin Brahîm Doskî ve li ber hinek nusxeyên destnivîs bi tehqîqî hatiye çapkirin. Çapa girîng a dawî jî ligel lêkolînek berfireh a di derheqê jiyana nivîskar û destpêkê ve li Stenbolê ji aliyê Mela Evdîlsemmed û Mela Evdîlsemmed çê bûye. Ev weşan a herî zanistî ya Mewlîda Kurdî ye. Dîsa tefsîrek a vê

³¹ <http://tr.m.wikipedia.org/wiki/memuzin>

³² GÜNEŞ Mustafa, Menakıb-ı Şeyh Sen'anî, H Yayınları, İstanbul, 2010, rp. 4

³³ ADAK Abdurrahman, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2014. Rp.243

Mewlîda Kurdî bi Erebî, ji aliyê Zeynelabidîn Amidî ve hatiye çê kirin û li Diyarbekirê çap bûye.

Mewlîda Kurdî qismen jî ji aliyê me'neyê ve dişibe Mewlîda Tirkî ya Silêman Çelebî (mirin: Bursa-528/1422) û ji metnê diyar dibe kul i ber wê hatiye nivîsandin. Heta ew pêlewazên bi “Merheba”yê dest pê dike eynî wekî pêlewazên “Merhaba”ya Mewlîda Silêman Çelebî ye û mîna wergera wê ye.”

Mewlîda Silêman Çelebî:

یارادلمش جمله اولدی شادمان
غم گیدوب عالم یگیدن بولدی جان

جمله ذرات جهان ایوب ندا
چاغریشوبن دیدیلرکم مرحبا

مرحبا أی عالی سلطان مرحبا
مرحبا أی کان عرفان مرحبا

مرحبا أی سر فرقان مرحبا
مرحبا أی درده درمان مرحبا

مرحبا أی بلبل باغ جمال
مرحبا أی آشنای ذوالجلال

مرحبا أی ماه وخرشید هدی
مرحبا أی حقندن اولمایان جدا

مرحبا أی عاصی امت ملجائی
مرحبا أی چاره سز لر أشفعی

مرحبا أی جان باقى مرحبا
مرحبا عشاقه ساقى مرحبا

مرحبا أی قرۃ العین خليل
مرحبا أی خاص محبوب جلیل

مرحبا أی رحمةً للعالمین
مرحبا سنسین شفیع المذنبین

مرحبا أی پادشاه دو جهان
سنڭ ایچون اولدی کون ایله مکان

أی جمالی گون یوزی بدر منیر
أی قمو دوشمشلره سن دستگیر

دستگیر بیسین قمو افتاده نڭ
هم پناهی بنده و آزاده نڭ

أی گوگلر در دینڭ درمانی سن
أی یرادلمشلاڭ سلطانی سن

سنسین اول سلطان جمله أنبیا
نورچشم اولیا و اصفیا

أی رسالت تختنڭ سن خاتمی
أی نبوت مهرینڭ خاتمی

چونکه نورڭ روشن ابتدی عالمی

كُلِّ جمالِكْ كَلشَن ايتدى عالمى

اولدى زائل ظلمت جهل و ضلال

بولدى باغ معرفت عين كمال

يا حبيب الله بزه امداد قيل

صوڭ نفس ديدار اڭ ايله شاد قيل

Yaradılmış cümle oldu şâduman

Gam gidüb âlem yeniden buldı cân

Cümle zerrât-ı cihân idüb nidâ

Çağrısuben didiler kim merhabâ

Merhabâ ey âlî Sultan merhabâ

Merhabâ ey kân-i irfân Merhabâ

Merhabâ ey Sırr-ı Furkân merhabâ

Merhabâ ey derde dermân merhabâ

Merhabâ ey bülbül-i bâğ-ı cemâl

Merhabâ ey âşina-yı Zü'l-Celâl

Merhabâ ey mâh u hurşîd-i hüda

Merhabâ ey Hakk'dan olmayan cüda

Merhabâ ey âsî ümmet melcei

Merhabâ ey çâresizler eşfa'ı

Merhabâ ey cân-ı Bâkî merhaba
Merhabâ uşşâka sâkî merhabâ

Merhabâ ey kurratu'l-Ayn-ı Halîl
Merhabâ ey hâs-ı mahbûb-ı Celîl

Merhabâ ey rahmeten lilâlemîn
Merhabâ sensin Şefîu'l-Müznibîn

Merhabâ ey padişah-ı dû cihân
Senin için oldı kevn ile mekân

Ey cemâlî gün yüzi bedr-i münîr
Ey kamu düşmişlere sen destgîr

Destgîrisin kamu üftâdenün
Hem penâhı bende vü âzâdenün

Ey gönüller derdinün dermânı sen
Ey yaratılmışların sultânı sen

Sensin ol sultân-ı cümle enbiyâ
Nûr-ı çeşm-i evliyâ vü asfiyâ

Ey risâlet tahtının sen hâtimi
Ey nübüvvet mührinün sen hâtemî

Çünkü nûrun rûşen itdi âlemi
Gül cemâlun gülşen itdi âlemi

Oldı zâil zulmet-i cehl ü dalâl
Buldı bâğ-ı ma'rifet 'ayn-ı kemâl

Yâ Habîballah bize imdâd kıl
Son nefes dîdârın ile şâd kıl

(Süleyman Çelebi, Mevlid, Rıza Efendi Neşri, 1327:8-9; Faruk K. Timurtaş Yayını, 1990: IX, 29, 99-101)

Mewlîda Mela Hisên Bateyî:

جمله ذرات جهان دا أف ندا
کرنه گازی پیکفه گوتن مرحبا

مرحبا أی سرّ فرقان مرحبا
مرحبا أی درمان دردان مرحبا

مرحبا أی جان باقی مرحبا
مرحبا أی عشاق ساقی مرحبا

مرحبا أی عالی سلطان مرحبا
مرحبا أی کان عرفان مرحبا

مرحبا أی شمس تابان مرحبا
مرحبا أی جان جانان مرحبا

مرحبا أی قرّة العین خليل
مرحبا أی خاص محبوب جلیل

مرحبا أى رحمة للعالمين
مرحبا أنت شفيع المذنبين

مرحبا أى أفتاب بى زوال
مرحبا أى ماه تاب لا يزال

مرحبا أى بلبل باغ وصال
مرحبا أى آشنای ذوالجلال

مرحبا أى نور خرشید خدا
مرحبا أى توژحق نابى جدا

مرحبا مطلوب عالم هرتوى
مرحبا اولاد هاشم هر توى

مرحبا أى نورحقرا مظهرى
مرحبا أى اوليارا سرورى

مرحبا هاتى شقان أمتى
مرحبا هات بومه نورا دولتى

مرحبا أى بدرعالم يا منير
مرحبا أى خلق كتى را دستگیر

مرحبا سلطان جمله أنبیا
مرحبا أى نورچشم أصفیا

Cümle zerrât-1 cihân dâ ev nidâ

Kérne gâzî pékve gotin merhabâ

Merhabâ ey Sırr-ı Furkân merhabâ
Merhabâ ey dermân-ı derdan merhabâ

Merhabâ ey cân-ı Bâkî merhabâ
Merhabâ uşşâk-ı sâkî merhabâ

Merhabâ ey âlî Sultan merhabâ
Merhabâ ey kân-ı irfân merhabâ

Merhabâ ey şems-ı tâbân merhabâ
Merhabâ ey cân-ı cânân merhabâ

Merhabâ ey kurratu'l-Ayn-ı Halîl
Merhabâ ey hâs-ı mahbûb-ı Celî

Merhabâ ey rahmeten lilâlemîn
Merhabâ tûyi Şefîu'l-Müznibîn
Merhabâ ey âfitâb-ı bîzewâl
Merhabâ ey mâh-ı tâb-ı lâyezâl

Merhabâ ey bülbül-ı bâğ-ı visâl
Merhabâ ey âşina-yı Zi'l-Celâl

Merhabâ ey nûr-ı hurşîd-ı Huda
Merhabâ ey tû ji Hakk nâbi cüda

Merhabâ matlûb-ı âlem her tûyi

Merhabâ ewlâd-ı Hâşim her tûyi

Merhabâ ey nûr-ı Hakkra mazhari

Merhabâ ey ewliyâra serweri

Merhabâ hâti şivân-i ümmeti

Merhabâ hât bûme nûra devleti

Merhabâ ey bedr-i âlem yâ Münîr

Merhabâ halk-i ketira destgîr

Merhabâ sultân-ı cümle enbiya

Merhabâ ey nûr-ı çeşm-i asfiya

(Hüseyn El-Batevî, Mevlid, Seyyid Şefik Arvasî Neşri: 24-25; Nubihar Yayınları Neşri: 2006:106-109)

Bi taybetî ew beyta wekî dîsgotin di nava pêlewaz û tewşîhê de tê dubarekirin jî
ji aliyê wateyê ve heman e:

گر د فیتن هون ژ نار بن نجات
بعشق و شوقك هون ببیژن الصلوة

گر دیلرسز بوله سز او ددن نجات
عشق ایله درد ایله ایدك الصلات

Ger dévitin hûn ji nâré bin necât

Bi'aşk o şevqek hûn bibéjin Es-Selât

Ger dilersiz bulasız oddan necât
'Işk ile derd ile eyidin Es-Salât"³⁴

Herwiha di Hawarê de (hejmara ya 33 an) Nûredîn Êsif ji nivîskarî Frensî Alphanse Daudet çîroka bi navê "Les Êtoiles" wekî "**Stêrk**" bi adapteyî kurdî kirîye.³⁵

Dîsa Celalet Bedîrxan di hejmara 31'an de ji nivîskarî Frensî "Alfred de Vigny çîroka bi navê "La mort du loup" wekî "**Mirina Gurî**" adapte kiriye. Celalet hem derheqê jîyana nivîskar de agahîyan dide hem ji sedemê adaptekirina (bi gotina wî "wergerandin")a vê çîrokê dike.³⁶ (**Hawar rp. 521-522**).

³⁴ divanpost.blogspot.com>kurtce-mevlid

³⁵ Nuredîn Êsif, "Stêrk", *Hawar*, (hj. 33), Belkî, Diyarbakır, 2012, rp. 556-557.

³⁶ Bedir-Xan Celadet Alî, "Mirina Gurî", *Hawar*, (hj. 31), Belkî, Diyarbakır, 2012, rp. 521-522.

WERGERA “NIVÎSKAR Û ŞEYTAN” A JI TIRKÎ³⁷

“Jiyana payîzê ya di demsala mirinê û zer û çilmisokî de çiqas dijwar e. Rojên cûn, ezmanêk bêroj û bigirî, şevên reş û tarî, bayên stranên bi kovan dibêjin, sihênpayîzê –ew sihên ku reş û tarî; ev hemû, tiştên tarî û ne zelal tînin bîra mirovan... Di giyana mirovî de sawek veşartî diwêlîde. Sawek ku di hundirê wê de tişt peyda nabe, bênavber diguhere, dizê. bêsl dibe, li hember jiyana ku dimire.

Carinan, dema payiz diqede, taqet di mirovî de namîne ku ligel fikr û hizrên tarî yên ku giyana wî pêçayî, şer bike! Ji ber vê, her kesê ku dixwaze ji êşa van xelas dibe, bila di demek nêz de rabe pêşwaziya van. Aha, rîya tekane ev e kuya mirov xwe ji tevlihevî û bêlayeniyê rizgar bike û jixwebawer pê li axa qewîn bike.

Lê ev, riyek dijwar e. Di nav striyan re derbas dibe. Ev strî, her dem dilê we yê ku tijî jiyana heta xwînê jê tîne, ji hev dike. Li ser vê rê her dem “şeytan” li benda we ye. Ev, ew şeytan e ku, ew ê Goetheyê mezin li we dayî naskirin, ”Şeytan”ê herî baş ê ku ji aliyê we ve tê zanîn e.

Aha, “Şeytan”ê ku ez behsa wî dikim ev e.

Bêhna şeytanî teng dibû.

Şeytan her dem bi kêrî xwe tê û kengî bixwaze dikare bikene. Wî jî dizanî ku di jiyana de hinek tişt hene ku şeytan bi xwe jî hêza kenî li xwe nabîne. Bo nimûnê şeytanî tu deman henekên dijwar li rastiya mezin a heyînê nekiriye. Heger mirov rastiye bibêje, Şeytanê me yê xoşewîst, ji bêaqilîyê bêtir heyberek bêrêz e. Heger mirov baldari lê binêre, mirov dê bibîne ku şeytan jî wekî me demeke xwe yê zêde ji bo tiştên

³⁷ Ev werger, min ji pirtûka “Maksim, Hikayeler, Werger: Hasan Ali Ediz, Weşanxaneya Cem, Stenbol, 2012,” kiriye.

tewşomewşo vediqetîne. Lê em vê berdîn... Hem em ne zarok in ku pêlîstoka xwe bişkînin, ji bo ku em tiştê di hundirê wê de, ya veşartî fêm bikin.

“Di tariya şevkî payizê de Iblîs, li gornistanê, di nav goran de digeriya. Bêhna wî teng bibû, fitik lêdixist û li derdora xwe dinêrî ku ji xwe re şahiyekê bibîne. Şeytanî bi fitikan romansek gelek kevin lêdixist, ev romansa ku bavê min jê hez dikir:

“Rojeke payizê

Li ber bayê diçû.

Pelek ji çiqilê xwe ketî...”

Ba li ser goran, di nav xaçên reş re difire û dizure. Û strana şeytanî dubare dikir. Ewrên payizê strayên teng ên miriyan bi hêstirên xwe yên sor av dida û hêdî hêdî dixijîya û diçû li ser rûyê ezmanî.

Darên goristanê yên dilpêşewat çiqilên xwe yên tazî ber bi ewrên bêdeng ve dirêj dikirin û li ber bayê bi bizdonekî diqîçqîçî. Çiqil li xaçan diket. Wê demê li goristanê xuşîniyek heznî, dengê giran û tirsder derdiket.

Şeytanî difitîkand û difikirî:

